*BO VÊ YEKÊ* ***TOBE BIKIN!***

*Lûqa 13:3* Lê belê ger hûn tobe nekin, hûn ê hemî bi vî awayî helaq bibin.

*Yûh 1:9* Lê belê ger em li gunehên xwe mukir bêne, Xwedayê ku ewlekar û dad e, dê li gunehên me biborîne û me ji hemî gunehan ve pak bike.

*Yûh 5:24* Bi rastî û bi rastî ez ji we re dibêjim: Her kesê ku gotinên min bibihîze û bawerî bi yê ku min şandiye re bîne, jiyana wî ya abadîn heye û nayê darazîkirin, lê belê ew ji mirinê derbasî jiyanê bûye.

*Rom. 10:9* Ger tu bi devê xwe, bi eşkereyî bibêje Îsa Xudan (Xelasker) e û ji dil baweriyê pê bîne ku Xwedê Wî ji mirinê vejandiye, tuyê xelas bibî!

**Gotina Xwedê; Încîlê Bixwînin!**
**Ger Încîl a we tunebe û hûn daxwazya xwe bigehînin me, em ê pariyek Încîlê bêpere ji we re bişînin. Em ê bi dilxweşî bona bersivandina pirsên we bixebitin.**

**Navnîşana Me ya Têkiliyê Ev e:**
Hoffnung und Leben e. V.
Postfach 10 13 82
33513 Bielefeld
Germany

Kurdisch

# 4 MIJARÊN GIRÎNG ÊN PÊWÎSTE KU HÛN BIZANIBIN

## I
## *Hebûna Pêdiviya We Ji Xelasiyê re*

*Rom. 3:23* Ji ber ku her kes guneh kir û ji bêyî Bilindahiya Xwedê ma.

*Waiz 7:20* Rastî, li rûyê erdê tu mirovê salih nîne ku qenciyê kiribe û sûcê nekiribe.

*Yêremya 17:9* Dil, berî her tiştî xapînok e û gellekî qels e; ma kî dikare wî fêhm bike?

*Îşaya 53:6* Me hemiyan mîna mîhan rê şaş kirin; her yekê ji me vegeriya ser rêya xwe û XUDAN fesadiya me hemiyan danî ser Wî.

*Yûh. 3:3* Heta ku kesek ji nû ve newelide, nikare Serweriya Xwedê bibîne!

## 2
## *Hûn Nikarin Bi Hewldana Xwe, Xwe Xelas Bikin*

*M. Silêman 14:12* Rêyek ûsa heye ku, ji mirov re rast xuya dike; lê belê dawiya wê mirin e.

*Aqûp 2:10* Ji ber kesê ku hemû gotinên Zagonê bîne cîh, lê tenê di nuxtikekê de ji wê derkeve, dê li dijî hemiya Zagonê bi sûc bibe.

*Galatiyan 2:16* Ji ber tu kes, bi kirinên pêdiviyên Zagonê pak nabin.

*Yûh 14:6* Îsa jê re got: "Rê, rastî û jiyan ez im." "Bêyî navgîniya min tu kes nikare were cem Bav."

*K.Şagirtan 4:12* Wekî din di tu kesî de xelasî nine; ji ber ku di binya ezmên de di nav mirovan de wekî din navekî ku hatiye dayîn nine ku, em bikaribin bi wî xelas bibin!

## 3
## *Xelasiya ku Îsa Mesîh Ji We re Pêk Aniye*

*Yûh. 3:16* Ji ber ku Xwedê evqasî pirr ji dinê hez kir ku, Mesîhê xwe yê tekane da; da ku, bila tu kes, ji yên bawerî bi Wî bîne helaq nebe, lê bila jiyana wî ya abadîn hebe.

*1. Pêtrûs 3:18* Ji ber ku, Mesîh jî bona me bighîne Xwedê bi kesê rast bûna xwe, di oxra kesên ne rast de, bi qurban bûna gunehan ve carekê mir.

*2.Korîntiyan 5:21* Xwedê, bona bi saya Mesîh em bibin rastiya Wî, Mesîhê ku bi gunehan nizane, bona me kir guneh.

*1.Pêtrûs 2:24* Bona em li dijî gunehê mirîbin, di oxra rastiyê de bijîn, wî bi xwe gunehên me di xaçê de li ser bedena xwe bar kir.

## 4
## Bêyî Alîkariya Îsa Mesîh Em Dê Têk Biçin

*Yûh. 8:24* Ger hûn baweriya xwe bi Îsa Mesih ve neynin, hûn ê di nava gunehên xwe de bimirin.

*Meta 13:41, 42* Dê Îsa Mesîh, milyaketên xwe bişîne û ew ê ji Serweriya Wî hemûyên ku, mirovan ji rê derdixînin û xerabiyê dikin, hilbijêrin û bavêjin agirê tifikê; li wir dê bibe girî û qirçîniya diranan.

*2.Sel. 1:7-9* Dema Îsa Mesîh, di nava pêtên agir de, bi milyaketên xwe yî xurt, ji ezman ve were û xuya bibe, dê Xwedênenasan û yên ku li gora mizgîniya ku di derheqê Wî de nekirine biceza bike.

*Peyxam 21:8* Lê belê dema em bêne yên tirsonek, bêbawerî, zişt, mêrkuj, ên bêexlaqiya cinsî dikin; sêrbaz, senemperest û hemî derewçînan, cihên wan gola agir ya ku bi kewkurdê dişewite ye; mirina duwemîn ev e.